Di peymana Lozanê de mafê kêmneteweyan

Bend 38: Hukimeta Tirk, kesên ku ji neteweyeke din in û li Tirkiyê dijîn (nasyonalîte), ferq naxe nav ziman, nijad an jî cudabûna wan a olî û ji parastina jiyan û azadiya wan berpirs e. Her kesî ku li Tirkiyê dijî, ji aliyê ol, mezhep û baweriyê ve çi vekirî û çi taybetî bi awayekî serbestî û vekirî mafê wî /wê hene.

Bend 39: Hemwelatiyên Tirkiyê yên ku ne musilman in, ew jî wek heman hemwelatiyên musilman xwedî mafên hemwelatî(huqûqa medenî) ne û ji mafê polîtîk payedar in. Her kesî ku li Tirkiyê dijî, bêcudatiya olî li hember qanûnî wekhev in. Cudatiyên olî, bawerî an jî mezhebî ne li peş mafê hemwelatiyê asteng (mafên medenî) e, divê kelk ji mafê polîtîk were girtin û bi taybetî pêwîst de ku di kar û barê dewletê de, payedayîn an ji di karen curbe cur û pîşeyî de, di dibistanên de an ji di beşên industriyê de li pêşî xebata wan asteng tune bin.

Bend 40: Hemwelatiyên Tirkiyê yên ku kêmneteweyên ne musilman in, hem ji aliyê huqûqî û him jî ji aliyê pratîkî ve, maf, kirarî û garantiya ku ji bo hemwelatiyên tirk hene û tên kirin, divê ji bo wan jî ev maf, garantî hebin û sûd û kelk bên wergirtin. Kêmneteweyên ne musilman dikarin bi hatin û pereyên xwe her cureyên xêretxane û dezgehan vekin, dem û dezgehên olî û civakî, her cureyê dibistan, dem û dezgehên perwerde û hîndekariyê damezrînin, birêve bibin, kontrol bikin, li cihên weha bi awayekî azad zimanê xwe bi kar bînin û xwedî maf in ku bi awayekî serbest îbadetên xwe bikin.

Bend 41: Di mijara hînkirin û perwerdeya giştî de, hukimeta tirk pêwîst e ku ji bo hemwelatiyên xwe yên ne musulman li bajar û bajarokan ku lê dijîn ji wan re derfetên ku bi zmanê xwe bixwînin û hîn bibin pêk bînin. Ev li dijberî perwerde û hîndekariya ku bi zimanê tirkî li dibistanan tê kirin ne asteng e. Kêmneteweyên ne musilman yên ku li bajer û bajarokan dijin, pêwîst e ku ji butçeya dewlet, belediye, dem û dezgehên xêrxwaz an ji butçeyên din, para wan a hînkirin û perwerdê were beşkirin û dayîn.

Bend 42: Hukimeta tirk divê rewşa malbatên kêmneteweyên ne musilman, statuya wan, li ber çav bigre, ji bo xurtkirin û geşkirina edet û çanda wan hewl bide û xebat bike. Ji bo vê yekê, divê ji kêmneteweyan û ji hukimeta tirk komîsyoneke taybetî were damezrandin û hejmara endamên komisyonê yên herdu aliyan wek hev bin. Heger lihevnekirin hebe, di navbera hukimeta tirk û huqûqvanên Cemiyeta Ewropayî de dê hakimekî were tayîn dikin. Hukimeta tirk ew kêmneteweyên ku navên wan derbas dibin, dêr, havra, goristan û hemû dem û dezgehên wan ên olî divê diparêze.

Bend 43: Kes nikare ji ber dîn an jî baweriyê zorê bide hemwelatiyên tirk yên ne musilman, dema ew di rojên tatîl û cejnan de beşdarî mehkeme û daîreyên fermî nebin, mafê wan yên qanûnî wenda nabin. Ev jî nayê vê wateyê ku ji bo asayîşa giştî ew ji hemwelatiyên tirk ên din bêtir xwedî hindek mafên taybetî ne.

Bend 44: Ev bendên jorîn her çiqas li Tirkiyê ji bo kêmneteweyên musilman bin ji, herweha bar û berpirsiyariyên navnetewî tîne holê û garantiya Cemiyeta Navnetewî qebûl dike. Ev bend û prensîp heta ji aliyê piraniya Cemiyeta Navnetewî ve nehêne guhertin, kes nikare biguhere. Hukimetên Împaratoriya Brîtanya, Fransa, Îtalya û Japonya, Meclîsa Cemiyeta Navnetewî heger bi piraniya dengan guhetinê di cîh de bibîne, wê demê peymanê qebûl dikin.

Bend 45: Ev bendên ku ji bo mafên kêmneteweyên ne musilman li Tirkiyê hatine danîn û mafên ku ji bo wan hatine pejrandin, herweha ji bo musilmanên li Yunanistanê jî derbas dibin.

Wergera ji tirkî: Amed Tîgrîs